

Nameyên Sersaxiyê

Bi xemgîniyeke zor giran me nûçeya jidestana mamosteyê hêja kek Sma'îl Umer bihîst. Birastî.. Ew nûçeye reş pir ji nişkave hat, koçkirina kek Sma'îl qet ne di bîr û balan de bû, û ji kûraniya dil wijdên de em êşandin.

Jidastana biracane hêja Sma'îl ne tenê di warê siyasî de ziyaneke mezin e, ew di warê çand û rewşenbiriye de jî, nemaze di warê çand û rewşenbiriya Kurdî de, ziyaneke zor mezin û pir giran e.

Em û kovara me PIRS di warê çap, belavkirin û pişgiriye de dendarê şexsê kek Sma'îl û hevalên partiya wî Partiya Yekîti Ya Demokrat a Kurd li Suryê ne, xemwariya wî ji bo derçûna kovara me ya bi zimanê dayîkê nayê jibîrkirin.

Birastî.. Yê ku kek Sma'îl nas dikir, zane ku kesên mîna wî di nav me de pir hindik in, salixên kesane yê payebilind û nirxdar ku li ba wî hebûn, bi hêsanî û bi hev re li ba kesekî peyda nabin.

Kek Sma'îl ta dawiya jiyana xwe ji doza azadiya gelê xwe yê Kurd re, û ji tevahiya nofên gelê Suryê re dilsoz bû; Ew rêberkî bîr fereh, pêdar, dilsoz, xwedî hjêviyên mirovane û mezin, û bi ser her tiştî de jî rewşenbîr û zana bû.

Bêguman.. Hêviyên wî di pêkanîna azadiyê de, ne xewn in û dê di demekê zû de pêk werin.

Kek Sma'îl dê herdem di bal û dilê me de be, û emê şopa xebata wî bi dilgermî bajon.

Bila serê gelê Kurd û hemî berketiyên ciwanemerg kek Sma'îl Umer xweş be.

Sernivîserê Kovar PIRS -

Efrîn... 19.10.2010

Nameyên Sersaxiyê

Birêz birêveberiya Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê...

Rêz û silav...

Mixabin, bi xem û kovanek mezin ve, me nûçeya koça dawiya mamoste Îsma'îl Umer Elî, Serokê partiya we ya xebatkar bihîst . Di vê derheqê de, tevî derbirîna xem û nerihetiyên xwe bona jidestçûna wî xebatkarê mandînenas ku bêguman xesarekî mezin e bo Tevgera Kurd bi giştî û bi taybetî bo partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, em behî û serxwesiyê xwe li we birêzan û hemû endam û alîgirên we , dost , nasyar û malbata birêz ya xwedê jê razî dikin û sebir û aramiyê ji tev aliyekê re dixwazin û xwe jî di vê xemê de bi şîrek û beşdar dizanin . Cihê xwedê jê razî buhuştta berîn be.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê Deftera siyasî

Ji: Dr. Kemal Sîdo – Ronîcar - Komela Roj ya çanda kurdî

Xwişk û birayên Hêja,

Bi xemgînî me agahdariya wefata birêz Isma'îl Emo, serokê Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd bihîst. Em bi vê xeberê gelek xemgîn bûn. Isma'îl Emo siyasetmedarekî Kurd î hêja bû. Ewî herdem jî bo mafên gelê Kurd têkoşîn û ji bo yekgirtina hêzên democrat ên Kurd xebat kiriye. Bila serê gelê Kurd û malbata wî sax be.

Dr. Kemal Sîdo

Bi navê hemî Kurdên me li Ispaniya ezê bêjim rehma Xwedê lê be .Xwedê sebrekê bide mala me hemîyan û mala serokê Partiya Yekîti Isma'îl Omer . Ew bira , heval, dost û serokê me hemîyan bû.

Ronîcar Ji Ispaniya